

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

*Xebat ji bo* :
*** Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.**
*** Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.**
*** Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.**



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên* Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

*Hejmar (107)* *Sal 20 Reşemeh 2015z - 2626k* *Buha (50)L.S*


## Seredana Kobaniya Berxwedêr

**Desteya sernivîser/Memê Alan**




Li roja 1/2/2015an, şandek bi navê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê, bi rêzdarî û coşeke biratî û bi hezkirinê ji aliyê serokê rêvebiriya Kantona Kobaniyê, birêz Enwer Mislim û şêwirmend û serokên komîteyên wê ve hate pêşwazîkirin. Piştî pêşwazîkirinê, danûstandin û gengeşekirineke berpirsiyarane û bi biratî li ser rewşa Kurd û Kurdistanê bi tevahî û rewşa Kobaniyê bi taybetî di navbera her du aliyan de hate kirin. Nêrînên her du aliyan di hemû pirs û pirsgirêkên ku gengeşe bûn de pir nêzî hev bûn.

Roja din programa şanda partiyê weha dest pê bû. Li siba roja Duşemê 2/2/2015an, şanda partiya Yekîtî li gel nûnerê rêvebiriyê, birayê hêja Ferhan Îsam, gerek li nava bajarê Kobaniya kavilkirî kir. Di wê gerê de, şandê bi çavê serê xwe hilweşandin û kavilkirina avahî û bingeha bajarê Kobaniyê bi dilekî xemgîn û tijî êş dît, herweha mayînên neteqiyayî, termên bi dehan ji têrorên rêxistina Daişê jî li kolanan dîtin. Piştî wê, şandeyê seredana navenda RêvebiriyaXwesr kir û ji aliyê mamoste Enwer Mislim ..................... 2

## Rizgarkirina Kobaniyê Serketina Kurdane

*Mihemed Qere Hesen*

Gotina "serketina kurdan bi yekîtiya wan e" baş hate nas kirin û rind ciyê xwe girt. Îro rastiya wê di rizgarkirina Kobaniyê de hatiye çespandin û berzkirin. Piştî berxwedana şerkerên Kurd YPG,YPJ, Pêşmergên kurdistanê û hin bêlûkên Artêşa Azad, bi piştgriya dewletên hevbend, li dirêjahiya bêtirî çar heyvan, şerekî giran ji ber axa Kobaniyê ve li dijî hêzên Daişa tundrew hate kirin.

Li destpêkê bajarê Kobanê hate ......................... 11

## Hêviyên Xwendekarên Sûryê Li Kû Man ...!?

*Rozad Elî*

Welat li ser pişta mirovê zana radibe û bi destê xortên xwende tê avakirin. Loma jî, gelên ku dixwazin ji tarîtiya nezaniyê derkevin, û welatên xwe li ser bingehên rast û durust ava bikin, giraniya xwe didin ser xwendina keç û lawên xwe, heyamên lêhatî û pêdviyên pêwîst ji bo şagirt û qutabiyên xwe peyda dikin, û ji hemî aliyan de alîkariya wan dikin. Ji ber ew zanin, ku qutabiyên niha, zanyar, şehreza, avakerên siberojê ......... 3

**Seredana …** Dûmahîk û alîgirên wî ve hate pêşewazîkirin.

Dûre seredana nanpêjgeha xweger(alî) a Kobaniyê kir û li wir jî ji aliyê rêvebiriya nanpêjgehê ve hat pêşwazîkirin. Ji wir jî çû serdana Navenda YPGê, li navendê berêz Ismet Şêx Hesen berpirsyarê berevaniyê li kantona Kobaniyê pêşwaziya şanda partiyê kir û tevlê bû. Pişt re, şande çû seredana navenda YPJ û ji aliyê şervana hêja Ezîme ve pêşwazî bû. Ji wir jî şande çû seredana goristana pakrewanan û fathek li ser giyanên pakrewanan xwend. Seredana dawiyê ji navenda pêşmergeyan re bû. Li wir jî sihbetek bi pêşmergeyên qehreman re hate kirin. Li dawiyê endamên şandeyê xatirê xwe ji Kobaniyê xast û bi rêketin. Hêja ye em bêjin, ku her du endamên serkirdeya Partiya me PYDKS hevalên hêja Mûsa Kino û Mislim Şêx Hesen biryara xwe dan, ku ewê derbasî bajarê xwe Kobaniyê bibin û wê nema vegerin Turkiyê, loma jî ew li wir man û bi şandeyê re venegerîn Tirkiy. Di seredanê de, ragihandina ajansa Hawarê gav bi gav hevaltiya şandeyê kir.

Armanca serekîn a şandê ji Kobaniyê re pîrozkirin, destxweşkirin û çavmaçîkirina ew hêzên ku Kobaniyê rizgar kirine (YPG, YPJ û pêşmerge) bû, û pêşkêşkirina hevkariya jinûveavakirina Kobaniyê bû.

Piştî seredana /24/ katjimêran ji Kobaniyê re, me kanî ev çend encam û sûd ji hestên xelkê Kobaniyê yên penaber werbigrtana:

1-Kobaniyê bi qehremaniya hêzên YPG, YPJ, şoreşgerên reqayê, bi piştgiriya pêşmergên qehreman û alîkariya balefirên dewletên hevpeyman ji ezmên ve, ji Daişê hate rizgarkirin.

2- Rewşa Rojavaya Kurdistanê bi taybetî û Kurdistanê bi tevayî ya piştî rizgarkirina Kobaniyê ji berî rizgarkirinê wê, pir cuda ye. Lihevkirina Kurdên Sûriyê her çû gerektir û pêwîstir bû.

3- Lidarxistina kongirekî niştimanî yî kurdî -li Kobaniyê yan li devereke din- zor pêwîst e. Û lidarxistina Kongirê Netewî Kurdistanî jî li roja îro berî sibe bibe.

4- Penda Kurdî dibêje: ``Yên lingên xwe di êgir de, ne mina yên ku lingên xwe di avê de ne`` ew wilo diramin.

5- Serkeftina yekê rizgarkirina Kobaniyê bû, lê serkeftina duyem û ya girîngtir û zehmetir jinûveavakirina wê ye. Jinûveavakirina Kobaniyê û vegerandina penaberên wê di ser partî û encûmenên siyasî re ne û divê nekeve tu bazarên siyasî.

6- Penaberên Kobaniyê dibêjin: Ne filan û ne bêvan aliyên siyasî, dibêjin: Berî her tiştî em Kurd in, û kîjan aliya di xizmet berjewendiya kurdayetiyê de be, û siyaseta xwe li gor wê bihûne, em li gel wî alî ne.

7- Li ber her kevirekî û bostek ji axa Kobaniyê qehremaniyek û çîrokek efsaneyî heye.

8- Li ber deriyên Kobaniyê metirsîdariya têrora Daişê hate şikestin û rûxandin. Şikestina wê di Kobaniyê de, ne tenê ji bo Kurdan bû, ew ji bo tevahiya cîhana azad û demuqrat bû.

# KOMARA MIHABADÊ Û SEDSALA BÎST Û YEKÊ

*Merwan Berekat*



**B**erî şêst û neh salan di 22. 01.1946an de, li bajarê Mihabadê, li qada Çarçiran, li Rojhilata Kurdistanê nemir Qadî Mihemed komaya Mihabadê ya Kurdî ragihand. Bi ew bûyera dîrokî hizreta dilê kurdan bi cî hat û sirûda Ey Reqîb li ezmanê Kurdistanê deng veda, û ala rengîn bi azadî li firehiya ezmanê welêt pêl da. Lê bila agirê volkaneke nevemrandî bi ser neyar û dijminên Kurdan de birijê, ku wan piştî yazdeh mehan komara di temenê ciwaniyê de têkbirin. Û pêncî û sê lehengên Kurd û digel wan serokê komarê nemir Qadî Mihemed li cihê ragihandina komarê darde kirin.

Rast e; ji bo gelê Kurd ew tirajîdiyeke zêdetirîn bi êş û bandor bû, lê ew pêncî û sê pakrewan bûn gerdenekî ji rûmetê û ta roja îroîn di stewê her kurdekî de hêz û vîna berxwedanê vedijînin. Û wesêkên Qadî Mihemed û hevalên wî weke sirûdên pêdarî, jiyan û berxwedana xebata kurdewariyê ne.

Ragihandina komara Mihabadê di nîvê sedsala bîstan de bû. Di wê demê de, ne tenê Rojhlata Navîn, lêbelê cîhan tev di rewşeke nêzîkî tevlehevîyê û ne aram de dijiya, ji ber ku bandora şerê cîhanê yê duyemîn li hemû dewletên cîhanê û nemaze li yên derdora Kurdistanê hebû. Di wê demê de - Ango dema ragihandina komara Mihabadê - hîn nexşeya ………… 11

**Hêviyên Xwende...** ..Dûmahîk

û hêviyên welatan ne. Welat bi destên wan tên avakirin, pêşde diçin û têne parstin jî.

Bûne çar sal, ku Sûryê di babelata xwe ya pir giran re derbas dibe. Hemî dever, bajar û gundên wê toşî wêrankirineke rojane û bê wijdan dibin. Hemî civak û pêkhatiyên wê bi agirê wê bobelatê têne daxdan. Kurd û Ereb, Misliman û File, ĥalxwaş û sêfîl, biçûk û mezin, jin û mêr, hemî endamên civakê û her welatiyek bi giranî pêrgî zor û zordariyên têvel û giran dibin.

Ji aliyekî de sazûmanê ter û hişk dane ber xwe, û hemî cureyên çekan li dijî giyanewer û negiyaneweran jî bikar tîne. Ji aliyên din de, gelek nofên çekdarên ku dixwazin xwe wek rikber rabigihînin û bidin nasîn, nemaze yên tundrew, ew jî gelek cureyên cekên kavildar, bê bend û merc di nava gund û bajaran de bikar tînin. Her du aliyên ev şerê qirêj, nabêjin ku ev sivîl in û ev jî leşger û çekdar in, ev şêngeh e û ev baregeheke serbazî ye. Û herwiha, di nava vê tevlehevî û şerê çepel de, xwîna mirovên destvala û bê sûc û guneh tê rêtin, arzûyên wan tên talankirin, û paşeroja nifşekî tekûz jî ji zarok û lawên Sûrî ji destê hemiyan diçe, çinkî, nofa ku bi giranî ziyanê ji bobelata qirêj dibîne û bêtir berdêlê dide, zarok, şagirt û xwendekar in.

Li gora serhejmarên sazûmanê û yên navdewletî jî, dora çar hezar û pêncsed dibistan ji kardayîna xwe derketine, gelek jê wêran bûne, hin ji hêla leşgerên sazûmanê û çekdarên rikberiyê ve hatine dagîrkirin, û gelek ji hêla penaberan ve têne bikaranîn. Eger li her dibistanekê bi navînî /300/ qutabî(şagirt) dixwend, hejmara wan dê bigihê nêzîkî milyon û nîvek şagirt, yanê bûye sê sal ku ew hejmara mezin ji zarokan ji xwendinê dûr ketine yan jî hîç ne çûne dibistanê.

Ji aliyekî din de, û li gora serhejmarên nêzerast ku ji hêla navendên nevdewletî de dertên, ta dawiya sala 2014an, dora du milyon û dused hezar zarokên Sûrî, yan li derveyî dibistanan mane, yan di rewşine xwendinê yen dijwar de dixwînin, yan jî bi şêwazên ne fermî, xwendineke ne birêkûpêk dikin. Li gelek deveran, hêza çekdar a ku li wê deverê destlatdar e, destê xwe datîne ser karûbarên dibistanan, û rêbazên fêrkirinê yên cuda û taybet li ser dibistanan ferz dike. Û ji ber ku paşeroja ew destlatên deverkî û wan rêbazan jî ne diyar e, tevlehevi-yek rastîn di warê perwerdeyê de çêdibe, û ziyan digihê karnava sîstema perwerdeya fermî û herwiha hatina şagirtan a dibistanan jî . Ango paşeroja şagirtan nenas dibe, û ew dikevin ber bayê qederê û li benda guhertina rewşan dimînin.

Di warê xwendina bilind de jî, û ji ber ku rewşa zanîngehan ji her aliyekî de kambax bûye, ziyan bêtir bûye û rewş jî bi tevahî tarîtir bûne; Herdem gengazî heye, ku her qutabiyekî zanîngehê, her roj û her katê, toşî dijwarî û buvehiyên rastînkî yên çekdarên her du aliyên keftleftê bibin.

Ji aliyekî din ve, li bajaran gelek mal û tax wêran bûn, bajar perçe bûne, peydakirina cihekî rûniştnê pir dijwar bûye, buhabûneke derhişî ji pêdviyên jiyanê re çêbûye û piraniya demê peyda jî nabin.

Ji aliyekî dîtir ve jî, wekî ku komên çekdarên tundrew dijminê xwendin û zanînê ne, ew zanîngehan jî dikin nîşana çekên xwe û wan jî bombebaran dikin; riyan li xwendekaran digirin û nahêlin bigihên zanîngehên xwe.

Ji bilî ku, dema qutabî dibîne, gava ku ew xwendina xwe bidawî bike, û derfeta kar wê jê re peyda nebe, û nikani be kar bike xwendekar û xudiyên wan jî, wê deh caran biramin, taku derbas zanîngehên Sûryê bibin, an jî biçin ber metirsiyan û salên ku jê re mane kuta bikin.

Piraniya van xal û pirsên ku di warê bidestxistina xwendinê de berçav in, li seranserî navçe û parêzgehên Sûryê hene, navçeyên Kurdî jî di nav de ne. Ango, dê û bav û xwendekarên me ketin nava sergêjiyeke mezin. Ji Dêrikê de bigire, li Rojhilat, û ta bajarokê Şiyê li Rojava, pirs yek e, ew jî wiha dibêje: Emê xwendina zaroyên xwe çawa bikin!? Lê ji ber ku, ta roja îro bersiveke durust ji wê pirsê re ne hatiye dîtin, zor mixabin! bi hezaran xwendekarên zanîngehan ji xwendina xwe dûr ketine. Piraniya wan, xwendina xwe di nîvî de hîştine û neçar bûn, yan li malên xwe rûnin, yan jî bi paş sînoran kevin û xwe bispêrin felekê!.

Çi dewlet, sazûman, şoreş, partî û ra ol jî, eger bixwazin bingeha civateke durust û pêşketî ava bikin, gerek e li destpêkê guh bidin zanîn û fêrkirinê. Pîvana rastî û durustiya wan di rêzgirtina xwendin, xwendevan û fêrgehan re xuya dibe. Gerek e fêrgeh, nemaze jî zanîngeh, rûmeteke mîna ya mizgeft û kinîsan bistînin. Çinkî mirov, civak û jiyan bi tevahî, li ser ronahiya zanînê ava dibin, ne li ser nezanî û tarîtiyê.

Eger sazûmana Sûrî, rikber û dewletên ku xwe dostên Sûriyan dibînin jî, rast xêrxwazên gelên Sûriyê ne, gerek e rêzdariya perwerde û xwendina zarokên me bigirin, û bi her hawakî jê re alîkar bin. Gerek e, zarokê Sûrî ji pêvajoya şaristaniyê netê birîn, û hêviya gelê Sûrî di paşeroja zarokên xwe de geş bimîne. Herkesek dizane, ku hemî nexweşiyên civakê, tundrêtî û têror jî di nav de, ji nezanî û xizaniyê de dest pê dibin û di nava wê de geş û gur dibin. Ew jî tenê bi xwendin, zanebûn û peydakirina jiyaneke bi rûmet têne dorpêçkirin, kaniya ew nexweşiyên civakî û ramanî ya metirsîdar bi zanînê dimiçiqe û dawî li zordarî û li tundrewiyê jî tê.

# Tozika Bingehîn ya Lêvegera Siyasî li Rojavaya Kurdistanê- Sûrya

**Dîbace**: Lêvegera siyasî ya Kurdî li Rojavaya Kurdistanê, desteyeke siyasî ye, ji nûnerên Tevgera Civaka Demoqratî TEV-DEM, Encûmena Niştimanî ya Kurdî ENKS û nûnerên partî û bizavên li derveya her du çarçewên jorîn pêk tê. Ew li ser bingeha levkirina Duhokê ya dîroka 22/10/2014an û biservehiya wê ya 24/1/2015an radibe, û ji bo danîna stratîcî û siyasetên giştî û pergalkirina helwesta kurdî ya yekgirtî li hemî warên ku têkildarê gelê Kurd in li Sûryê, hatiye avakirin.

## Beşê Yekemîn.

**Danasîn.**

Made /1/ navê Lêvegerê: Lêvegera Siyasî ya Kurdî li Rojavaya Kurdistanê – Sûrya.

Made /2/ dirûşma Lêvegerê:

Made /3/ malbenda Lêvegerê: Qamîşlo.

## Beşê Duyemîn.

**Karûbar û Armancên Lêvegerê.**

Made /4/ ((Nêrîna siyasî ya kurdî ya hevbeş, ewa ku li 23/11/2012an her du encûmenên kurdî “Encûmena gel a Rojvaya Kurdistanê û Encûmena Niştimanî ya Kurdî li ser lihevkiri bûn ji xwe re dike bingeh”: Sûrya dewleteke yekgirtî, piralî, demoqrat, perlemanî û pirnetew e, ji ber wê jî pêwîstî heye, ku dewlet ji nû ve li gor sîstema yekgirtî ya federalî were avakirin, û mafên hemî pêkhateyan were bidestxistin. Di warê çareserkirina doza Kurdî de jî, Kurd mîna neteweke xudî yekîtiyeke xaknîgarî û siyasî ye, ew sergihayî were nasîn û di destûrê de mafên rewa yên gelê Kurd li Sûryê, li gor peyman û belgeyên nevdewletî werin çespandin)), li wê derbarê pêwîst e jî, ku rewşên nûhatî, guherînên hundurîn û herêmî û navdewletî bi çavekî erênî werin birin.

Made /5/ kar ji bo xurtkirina pêwendiyên kurdistanî were kirin, karê hevbeş û şêweya karên wê pêşde biçin, û heyamê ji bo girêdana kongira netewî peyda bikin.

Made /6/ rêz li mafên mirov û azdiyên giştî li gor peyman û belgeyên navdewletî were girtin, aştiya gelêrî û jiyana hevbeş di navbera hemî pêkhateyên civakê de were parastin.

Made /7/ kar ji bo pêkanîna levkirina Duhokê were kirin.

## Beşê Sêyemîn.

**Pirênsîbên Bingehîn ên Tevahî.**

Made /8/ Endamên Lêvegera siyasî di maf û erkên xwe de wek hev in.

Made /9/ Endamê Lêvegera siyasî ji hêla zagonî de parastî ye.

## Beşê Çaremîn.

**Şêweyê kar û girêdana civînan.**

Made /10/. Di Lêvegerê de biryar bi livekirinê têne standin.

Made /11/ civîna Lêvegerê bi amadebûna %75 ji endamên wê rewa dibe.

Made / 12/ Lêveger her 15 rojan civîna xwe girê dide.

Made /13/ sê endam karûbarên kargêrî yên Lêvegerê bi rê ve dibin, ew her sê mehan tên guhertin û rajeya nûnertiya jinan tê de parastî ye.

## Beşê Pêncemîn.

**Nivîsgehên Lêvegerê.**

Made /14/ ji mafê Lêvegerê ye, ku li gor pêdviyê, komîte û nivîsgehan ava bike.

## Beşê Şeşmîn.

**Jidestdana endamtiytê.**

Made /15/.

1- Jikarvekêşan.

2- Tewaneke xuya kirî.

3- Bê sedemeke pejrandî li sê civînan li ser hev û amade nebe.

4- Eger biryarek li dermafê endamekî di hundur pêkhateya wî de were standin û Lêveger di civîneke fermî de pê hate agahdarkirin.

## Beşê Heftemîn.

**Diravî.**

Made /16/ diraviya Lêvegerê ji baça Xwesriya Demoqrat û alîkariyan tê birin.

## Beşê Heştemîn.

Bendine giştî.

Made /17/ gengaze ku bendên vê tozika bi erêkirina %75 ji endamên Lêvegerê ji nû de werin durustkirin….

***Wergerandin ji Erebî: Rozad Elî.***

# Wergerandin û Bandora Xwe di Pêşketina Miletan de

D. Deştê

Wergerandin dûbarekirina nivîsandinê bi xwe ye, lê bi zimanekî nuh û têvel. Wergêr jî bi vî awayî dibe ew kesê nivîsarekê ji zimanekî diguhêze zimanekî dî.

Her wekû em dizanin, eger ziman nîşana hebûna miletan e, wergerandin nîşana pêşveçûn û şaristaniyê ye. Çunkî wergêr bi xwe çalakiyên civakî, siyasî, hozanî, ramyarî, ... H.W.D, yên di jiyana miletan de, ji wan zimanên biyanî diguhêze zimanê xwe yan bervajî wê û li ber çavan datîne. Herwiha, Wergêr bizav û serpêhatiyên miletan, ên di dîrokê de borîne û yên hevdem jî, diguhêze zimanê xwe yê resen da ku miletê wî sûdê jê werbigire. Ji ber vê hindê, wergerandin tê nasîn wekû beşekî sereke ji beşên zanyariyê ku roleke mezin di jiyan û pêşketina netewan de dilîze.

Digel ku hin xal û bendên hevbeş di navbera zimanan de hene jî, lê bêguman, avabûna her zimanekî li gor rêzimaneke taybet e, û ev jî yek ji hêmanên cudabûna zimanan ji hev e. Wergerandin ne guhertina bêjeyekê bi wateya wê ye, lê belê ew guhestina hest, raman û nerînên nivîskar bi xwe ye; Ango naveroka babet û mijaran tê guhestin û bi zimanekî nuh tê nivîsandin. Bê guman ji bo ku wergêr armancên xwe bi cî bike, pêdivî ye ew hin merc û pîvanan bikar bîne û bişopîne.

Ji bo wergerandineke rast û durust, li destpêkê, pêdiviya sereke ew e ku wergêr fêrî herdu ziman û rêzimanên wan bûbe, da ku mebesta nivîskar baş nas bike, û di zimanê nuh de jî bi rengekî pîşezanî bi cih bike. Dû vê re, ji bo wergerandineke tekûz, têgihiştina çanda herdu zimanan hêmaneke pêwîst û sereke ye. Mercê sisiyê ew e, gerek e wergêr di warê metelok û rewanbêjiyê, di herdu zimanan de têgihayî be, ji bo ku bijartina peyv û bêjeyên hinkûf û hevser yên mebesta nivîskar bi şêweyekî durust û rewa û bi zelalî biguhêze.

Dema mirov li dîrokê vedigere û li ser kevnetor û jêmaya miletan radiweste, tê xuyakirin ku bandora wergerandinê di pêşketina miletan û dewlemenkirina şaristaniyê de bandoreke pir gewre û giranbuha ye. Ev jî di dîrokê de baş diyar e, weku wergerandina berhemên Igrîkiyan û Hindosan bo zimanên din. Di pêvajoya ola Islamê de ev baş tê xuyakirin, nexasim di dema Emewiyan de û di pey wê re, û bi ferehî di qonaxa Ebasiyan de. Giring e em zanibin ku wergerandin ne girêdayî ye bi jiyana miletekî tenê, ne jî bi zimanekî tenê, lê belê sînor jê re nayên danîn, ji ber ku nemandên civakê di dîroka miletan de li seranserî dîrokê, xwedî roleke mezin in.

Mixabin, em dibînin ku miletê Kurd, wekû miletekî jîndar û giyanwer, xwe ji dergehê dîrokê derdixe bi nebikaranîna wergerandina berhem û serpêhatiyên miletan, çi kevin û çi hevdem bin. Lê kêmasiya mezintir ew e ku berhemên nivîskarên Kurd, ên bi zimanên biyanî hatine nivîsîn, bi zimanê kurdî hatibane wergerandin ji bo zengînkirina pirtûkxana kurdî. Ez gorî, xwendevanên kurd, wê bi çi hestî berhemên nivîskarên Kurd bi zimanin biyanî bixwînin!

# Cejna “Xidir-Ilyas” li herêma Efrîn li dar dikeve ..

Bi hin lave û sirûdên olî, kurdên Êzdî cejna Xidir-Ilyas li dar dixin. Ev cejna dikeve şeva îna yekemîn ji meha Reşmehê bi demnama Rojhilatî. Piştî rojiya sê rojan, bi taybet jî ji hîla kesên ku navê wan Xidir û Ilyas û kesên oldar ve tê girtin. Şerjêkirina qurbanan di vê çejnê qedexe ye. Xarineke wê ye taybet heye jê re "pêxûn" tê gotin. Weteya wê ew e ku xûn ne tê rijandin. Ew ji ji tevlîhevkirina heft cureyên tene, belkî bêtir jî, pêk tê. Hemû kes bi çûk û mezin jê dixwin û li ser çandiniyan jî tê reşandin, da ku bereket pêtir bibe. Hinekî jî jê dihêlin û di hêvara çejnê-şeva Înê- de dixwin. Ji ber ku di baweriyên êzdîyan de, her du pêxember “Xidir û Ilyas” li malan digerin da ku xêr û bereket li ser malan belav bibe. Wek tê bawerkirin, li vê cejnê mirazên xort û keçan pêk tê. Loma jî keç û xort di şeva cejnê de “pêxûnê” dixwin da ku mirazên dilên wan bi çih werin, û eger kesên ne zewicî(keç û xort) kê di xewna xwe de bibînin, ew keç û xort wê bibin qismetê hev.



# Daxwaziya jiyanê ji mirinê xortir e

**Belkî ne cara yekmîn bû û xuya ye wê ne ya dawîyê be jî...**

*Ehmedê Qitmê*




Erê rojên 15-1-2013, 28-12-2014 û 10-1-2015an tenê hejmar û dîrok in , lê ewê di bîra şêniyê gundê Qitmê û tevahiya navça Efrînê de wek dîrokine reş bimînin.

Di wan sê rojan de, gundê Qitmê rastî rûreşiyên têrorê hat û di encamê de hejmarek zarok, jin û mêr jiyana xwe ji dest dan û hin jî birîndar bûn.

Di dîroka yekemîn de li 15-1-2013an, gundê Qitmê ji nîşkave rastî hêrişekê ji alîyê balefirên rêjîma Sûriyê de hat, û di encamê de 5/kesên bê guneh, di nav de pîrejinek û zarokên wê jiyana xwe ji dest dan.


Li dîroka 28-12-2014an jî, têrorîstan xwast ku sal bi komkûjîkê were bidawîkirin, wan makîneke bombekirî li ber rêbenda YPG a li nêzik gundê Qitmê li ser riya Helebê teqanid û di encamê de 6/kesan jiyana xwe ji dest da, 4 ji wan şervanên YPG bûn.

Di dîroka sîyemîn de li 10-1-2015an, dîsa li ser rêbenda YPG ya li nêzîk gundê Qitmê li nêzik gund, dûyemîn makîneya bombekirî hate teqandin û di encama wê de çend şervanên Kurd ji endamên YPG û kesine sivîl jî jiyana xwe ji dest dan.

Ev êrîşên hovane û çepel ku têne kirin, ji ber ku hêzên tarîtiyê û mejiyê wan ê kufkî û qirêj naxwazin cihekî aram ji bo ronahiya rojê û aştiya dara zeytûna pîroz li devereke Sûriyê bimîne. Loma jî guman heye ku ew hergav wê jî werin kirin,

Belkî ji qederê ye, dihêle ku Kurd herdem hêza Ehoramezda ya xêrxaziyê bin û li hember hêza Ehrîmen ya tarîtiyê bisekinin. Rast e; çênabe ku Ezdehak li ser Kawa, şer li ser xêr û mirin li ser jiyanê bi ser kevin. Û ew kujerên çepel, eger kî dibin bila bibin, ewê nikari bin tirsê têxin dilê xelkê me, yan jî kenê zarokên me têk bixin. Loma jî, li roja din, zarokên Qitmê derketin ser girê gund, ne tenê ji bo ku bi berfê bilîzin, vê carê daku namekê ji tarîyê re bişînin, û tê de bêjin, jiyan berdewam e, û ta ku em hene hêvî wê bimîne. Û bêguman, rojek wê were, zarok wê mezin bibin, kulîk jî wê di bûhara welatekî ku navê wî kurdistan û di xewn û xeyala aşiqên wê de, wê bi hemî rengên jiyaynê bibişkivin.

# Bîranîna Salvegera Siyemîn ya Pakrewan Dr. Şêrzad Hacî Reşîd



Li roja 9.2.2015an, li nava goristana gundê Elemdara- Efrîn, bi beşdariya bi dehan ji xwedî, heval û hogirên Dr.Şêrzad, Partiya Yekîtî ya Dêmoqrat a Kurd li Sûriyê salvegera siyemîn a şehîdkirina wî bi bîr anîn. Di pêşî de, mamoste Reşîtê Çençeliya pêşwaziya hemî beşdaran kir, paşê mamoste Husên Teremûş kurtegotinek bi navê serkirdayetiya partiya PYDKS li ser xebata nemir got. Li Dawiyê, birayê nemir jî Dilovan Hecî Reşîd bi navê malbatê sipasiya endamên partiyê û hemî beşdaran kir.

# Salvegera Duyem ya Pakrewaniya Heval Kemal Henan

Li roja 31-1-2015an, bi boneya yadeya duyemîn ya şehîdbûna endamê desteya sernivîser a rojnama me ``Newroz`` û hevalê partiya me Partiya Yekîtî a Demoqratî a Kurdî li Sûryê, hejmarek ji hevalên partiyê, di nav de serkirdeyên partiyê û endamên desteya sernivîser a rojnama ``Newroz``, ku nemir Kemal rêvebirê wê bû jî hebûn, seredana gora hevalê nemir Kemal Henan li gundê Tilifê kirin. Hevalên partiyê ji hêla şêniyê gund, mirovên wî û kebaniya wî diya Şiyar de hatin pêşwazîkirin. Li ber gora hevalê nemir, amadeyî xulekek bêdeng ji bona nemir Kemal û hemî şehîdên Kurd û Kurdistanê rawestîn. Pişt re, endamê serkirdeya Partî heval HusênTeremûş kurtegotinek got, tê de li ser sincî û xebata hevalê nemir Kemal rawestî û bi bilindî nirxand.

Pişt re, kebaniya hevalê nemir xanim Fatme xêrhatin û spasiya hevalan kir, û wiha got: Bi rastî, dema ku ez hevalên Bavê Şiyar dibînim, ku ew li ser doza gelê xwe ne, li ser iya partiya xwe ne û xebata xwe bi dilsozî dajon, ez hestewar dibim, ku




Kemal di nav me de ye û nemiriye. Bêguman, ew jî niha wek her Kurdekî, bi vegerandina ``Kobanê`` ji destê rêxistina DAIŞê ya hov, dilşad û dilxwaş e.

Pişt re, li ser vexwandina xanim Fatme, hevalan seredana mala Bavê Şiyar kiri ku niha malbateke ji Kurdên me yên Kobanê tê de rûdine.

Bila serê kebaniya heval Kemal, zaro, heval û dostên wî xweş be. Em jî wek wî digot, dibêjin: ``Ga dimire çerm dimîne, mirov dimire nav dimîne``. Belê Heval Kemal, navê te wê her û her zindî bimîne.

## Çelrojiya Hevalê Nemir Ebdirehman Hemadê



Li kat 12 ji roja Pêncşemê 12.2.2015an, li nava goristana gundê Çolaqa- Efrîn, bi beşdariya bi dehan meriv, heval û dostan, çelrojiya nemirê hêja, hevalê Partiya Yekîtî ya Dêmoqrat a kurd Mamoste Ebdirehman Hemadê hate vejenandin û ked û xebata wî ya dehsalan hate bi bîranîn. Di serî de heval Mihemed gotineke bi navê rêxistina devera Xastiya li derbareyî jiyan, sinc û dilsoziya nemir xwend. Dû re, mamoste Husên Teremûş bi navê sekirdayetiya partiya Yekîtî gotineke kurt got, tê de salixên pak, sinciyên bilind û dilsoziya heval Ebdirehman ji doza gelê xwe re anî zimên.

## Salvegera Hevalê Pakrewan “Dilovan Mamo”




Li roja 12.2.2015an, li gundê “Aşka Roja-va”-Efrînê, bi beşdariya bi sedan heval, dost û xelkê gundê Aşka, salvegera şehîdbûna hevalê partiya Yekîtî ya Dêmoqrat a Kurd, ku li ser destê kujerên Daişê hate şehîdkirin bi bîranîn. Li ber gora Şehîd, mamoste Elî Şetê gotinek bi navê serkirdeya partiya Yekîtî pêşkêşî beşdaran kir. Pişt re, bavê şehîd berêz Fayiq Mamo bi dilşewatî û coşeke mezin sipasiya partiya Yekîtî û hemû mêvanan kir.

# " Roja Cîhanî Ya Zimanê Dayikê " Rojeke Cejin û pîroz e .

*Rêberê Silîvî*

Bi helkeftina "**Roja Cîhanî Ya Zimanê Dayikê**", Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî şêvbêrkek li Qamîşlo, û li deverine din jî li dar xistin, û nûnerên desteyên sernivîser ên Kovar **PIRS** û Weşana **NEWROZ** gotinek di şevbuhêrkê de xwendin. Li jêr, emê bendina ji deqa wê gotinê ji xwendevanan re biweşînin:

***************

**Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî!**

Beşdarên bi rûmet, xwişk û birayên hêja! Demên we xweş bin… !

Bi armanca hevrejiyana hemû çand, ol û şaristaniyan, û parastina ziman û kelepûra hûrgel û kêmnetewan ji pişaftin û windabûnê, di kongreya xwe ya giştî ya roja 19ê Çiriya Paşîn a sala 1999an de, Rêxistina UNESCOyê, biryar bi destnîşankirina roja 21ê Sibatê, weke "**Roja Cîhanî Ya Zimanê Dayikê**" wergirtiye, da ku di vê rojê de, li seranserî cîhanê, rûmet ji zimanên hemû gelan re, çi piçûk çi mezin, bête girtin, rê li ber çavsorî, nijadperestî û hovîtiyê bê birîn, û li ber nirxên mirovhezî û aştîxwaziyê bête dûzkirin.

Di vê rojê de li sala 1952an, xwepêşandaneke aştiyane ji bal xwendekarên Bengalî ve li bajarê **Dakayê** ku li wê demê girêdayî dewleta Pakistanê bû, li dar ket, daxwaza wê ew bû ku zimanê Bengalî li kêleka zimanê Ordo li welêt bibe zimanê fermî, û ew bend û qeydên qedexekirinê bêne şikandin. Lê mixabin, dezgehên ewlehiya dewletê, bi gule û



“ Ahenga Qamîşlo “

qurşînan bersiva xendekaran da, xwîna wan rijandin û pênc kes hatin kuştin!. Ew tewana kirêt a xemgîn û bi keser, bû eger, ku xwepêşandan li seranserî welêt berfiretir bibin, û li dawiyê, dewlet neçar bû, ku li sala 1956an biryarê bi fermîkirina zimanê Bengalî bide, û yasayên qedexekirinê ji ser rake. Bo rêzgirtinê ji giyanê wan xwendekarên fîdakar re, ev roj ji bal UNESCO ve bi "**Roja Cîhanî Ya Zimanê Dayikê**" hatiye bi nav kirin ………….. Dema ku mirovên şoven, nezan, hişteng û nêzbîn, ewên ku li ser kîn û zikreşiyê hatine perwerdekirin li welatan re dibine berpirs û xwedî biryar, bi mebesta berdewamiya zeftkirina destelatê, bi dirindeyî stoyê gelên xwe badidin, hemû cûreyên tund û tûjiyê li hember wî bi kar tînin, û ji bo lawazkirin û jihevxistina civakê, şer û pevçûnan derdixine holê, ziman û folklora gelên bindest qedexe dikin, rê li ber jiyana wan a xwerist digirin, û tovên neyartî, berberî û tixumperestiyê diçînin.

Di vî warî de …… , zordestiya hovane li dijî hebûna zimanê Kurdî li dirêjiya sedsala borî ji bal dewletên ku gel û welatê me dagîr kirine hê jî li dar e, û her bi pêlan xwestine ew zimanê ku derdora 45 milyon mirov pê diaxivin, ji holê rakin………

Ji bo parastin û pêşvebirina hemû zimanên gelan, nemaze yên di bin gefê de ne, pêwist e xebateke hevbeş li ser asta cîhanê were kirin…...

Li dawiyê, Kovara **PIRS** û weşana **NEWROZ** ku ji berî bîst salan ve, bi zimanê dayika me, di merc û hoyên tepeserkirin û qedexekirinê de, li welêt têne weşandin û belavkirin, bi dilxweşî "**Roja Cîhanî ya Zimanê Dayikê**" li gelê Kurd, û hemû gelên cîhanê pîroz dikin.

- Silav ji "**Roja Cîhanî Ya Zimanê Dayikê**" re!

- Bijî xebata Zimanzan, Rewşenbîr, Nivîskar û xebatkarên zimanê Kurdî yê şêrîn!

**… Qamîşlo…**

**21.02.2015Z- 2626K**

# WELATO..!

Osman Îso

Ji xwîna pakrewanan
gîyanê axa me
tene bi tene
dûr û kûr zîl dane
dilopên pîroz ji kaniyên zarokan
keserên dilşikestî ji hinavên dayika
heft asîman li ezber kirine
û li ser şaxê ronahîya bi kul pal vedane
***
Aaaax welato!
Deryayên cîhanê li ser te digirîn
çilpik bi çilpik
di nav xuya sekranê de
lal û şor û şîn bûne
***
Aaaax welato!
Gundên bi ser kavilên xwe de dinalin
îro di nav rûpelên tariyê de
tev ji bîr bûne
erêêê.. erê welato!
***
Zinarên çiyayê Lêlûn
yên di çavên berbanga cîhanê de
roj hildane
û lêmiştên Skender
û bablîskên hovane kedî kirine
der bi der
îro dişewitin li benda te
û lal bûne.
***
Aaaax.. welato!
Hirç, hov û rûvî
li nav daristanên te kom bûne
hevdên riya yên dirêêêêêj
bûne mar û li nav şikêrên te
belav bûne
qurşînên êlî û olî
li ser sîngê te gur bûne
lê leheng bûne lehî û kember
û mirin ji wan re ava kewserê ye
û awazên berevaniyê bûne bilbil
li aso belav bûne
û di bin bîna kulîlkan de
sînor ji siya xwe vediciniqin
serxweş û winda bûne.
***
Aaaax welato!
Dîroka me kayîkê dike
û ramanên stewir
mêrxazan winda dike
tamarên zanînê hildike
milet ji hev cuda dike.
***
Erêêê.. welato!
Aaaax welato!
Tenê perçebûn
di nav te de her dimire
di xwîna me de zîl dide
û serî bi hêz hildide
û dilê me kurdan daxdide
dax dide
dax dide
aaaax welato!

# KENÊ BERBANGÊ

Îlham Osman

Di bin sîwana şevê de
nepîrçekên xewnan
hin rengên
tabloya kenê min
ê veşartî didizîn
lê nikanîbûn
ez ji mîvandariya
buhişta evînê
revandin bidama.
Di çavên min de..
kevokên mereqan difirîn
di gulista sîngê hêvîdar de
sosinan semînarên evîndariyê
li dar dixistin
û beyarên ciwaniya te
li min pîroz dikirin.
Hêviyên veşartî..
çîrokên xwe
bi mitêla gulgulî re
parve dikirin
Carina jî…
bi rengê şevê re
kenê stêrkan bîrve diçûn
awaza tavên baranê
şev dikir xewê
û di çavên min de
xew hişyar dikir.
Pênûsa dilgerm
dêmên rûpelê radimûsandin
ew bi helbestekê serxweş dikir
berî ku..
kenê berbangê
siruştê serxweş bike
helbesta min
berbang dînok kir.

# Mawrêtsyo Garzonî

*Nivîskarê Erebî: Suhêb Seyda*

Baba Mawrêtsyo Garzonî (1734-1804) danerê pirtûka "Rêzman û Bêjeyên Zimanê Kurdî" ye. Ew nasikekî Domînîkanî yî Îtalî bû. Piştî ku ev pirtûka wî derket, ew li Ewrupa hat naskirin û bi (Bavê Kurdolociya) û (Pêşengê rêzman Kurdî) hat binavkirin.

Pirtûk li sala 1787an li Roma-Îtalya, ji hêla weşanxana (Sacra Congregazione di propaganda fide) hatiye çapkirin. Pirtûk ji 288 rûpelan pêk tê. Kûpiya wê ya resen li pirtûkxana Zanîngeha Oxfordê li Birêtaniya parastiye. Garzonî ferhengokeke biçûk, ku ji dora 4500 şorî pêk tê jî, bi dawiya pirtûkê xistiye. Pirtûk li sala 1826an careke din hate çapkirin, û li Istembûl, Bexdad û Diyarbekrê jê hat firotin. Garzonî alikariya şagirt û hevalê xwe yê dîroknivîs û regeznas Ciyozîpî Kampalînî jî kir, dema ku wî pirtûka "Dîroka Herêma Kurdistanê û Olên Ku Li Wir Hene" ( Storia della regione de Kurdistan e delle di religione ivi esistenti ) danî.

Bawer dibe, ku pirtûka (Rêzman û Bêjeyên Kurdî) ya Garzonî, ku li Romayê hate weşandin, lêmikûrhatina zanistî ya yekê bû bi resentiya zimanê Kurdî. Çinkî ew pirtûka, di warê pesendkirina ji bo peydakirina rêbazeke naskirî ji nivîsandina zimanê Kurdî re hewildana yekê bû. Ew rênasîna yekê û rêzimana destpêkê bû jî, ku ji hêla Nasikê Îtalî yê Domênîkanî Marîtsyo Garzonî ji zimanê Kurtdî re hatiye nivîsandin. Mebesta wî ew bû, ku dozeolên Fileh kani bin bi kesên ku bi Kurmanî deng dikin re baxivin.

Garzonî li sala 1762an gihîşte bajarê Mûsilê ku 400 km li Bakurê Bexdadê dikeve, û ra sala 1787an li gel nasikê berî xwe (Domênîko Lanza) û yê piştî xwe jî (Cozîpî Kampalînî) li wir jiya. Ew dora 20 salan li Qeza Mûsilê di nav Kurdan de jiya. Roleke Garzonî ye giring di naskirin û nasandina navçê de hebû. Wî bi gotinên diyar û zelal bingeha civakî, siyasî û aborî ya civaka Kurdî salix da.

Garzonî raporek nivîsand û tê de got: Her Filehekî bi zimanê xwe dinivîsand û dixwend, lê belê ew hemî neçar bûn ku zimanê Kurdî zani bin; ne tenê ji bo danûstandina xwe ya rojane bi Misliman re, ji bo danûstandina xwe ya aborî jî bi xanedanên Kurd û pêşewên hozên kurdî re li navçê.

Pirtrûka (Rêzman û Bêjeyên Zimanê Kurdî) ya Garzonî, di dîroka kurdî de pir giring e, ew pirtûka yekê ye ku reseniya zimanê Kurdî li ser bingeheke zanistî dupat dike. Wêlomê jî, xudiyê wê navê (Bavê Kurdnasiyê) û (pêşengê rêzmana Kurdî) wergirt.

---

1-Ji malpera: Medaratkurd.com.. Wergerandin ji Erebî: Rozad Elî.
2 -Jêgireke elêktronî ji vê pirtûkê li Amojgeha Kurdî ya Parîsê heye.
3- ( Giuseppe Campanile- 1762-1835 ), nasik û dîroknivîsekî Îtalî ye, demek dirêj li Mûsilê jiyaye. Pirtûkeke hêja bi navê ((dîroka herêma Kurdistanê û olên ku lê hene))- ) Storia della regione del kurdistan e delle di religione ivi esistenti) nivîsand. Ew li sala 1818an li Naplî-Îtaliya hate çapkirin.

# Rola Jina Kurd di Şoreşê de

*Vejîna Kurd*

Bêguman qeyrana Sûriyê bandora xwe ya neyînî li hemû aliyên jiyanê yên civakî, aborî û siyasî kiriye, û heya îro jî, ji bo çareserkirinê tu piroje li meydanê ne diyar in, û roj bi roj, rewşa gelê Sûriyê bi giştî, û ya kurdan jî di nav de zehmetir dibe. Di ev rewşa kambax û dijwar de, jina Kurd jî temenê vê tevleheviyê dide. Lê tevlî wê, ew ji avakirina kesayetiya xwe ya civakî, rewşenbîrî û erkên xwe dûr neketiye.

Di destpêka şoreşa Sûriyê de, jina Kurd jî wekî hemû jinên Sûriyê, ji bo azadiya gelê Kurd li rex mêran sekinî û dengê xwe bilind kir, ji ber wê jî gelek ji wan hatin girtin, binçavkirin û gelekan jî jiyana xwe ji dest dan. Lê tevlî wê jî, tucarî vîna wê lawaz nebû û ew ji ser riya tekoşînê venegerî, ew yek jî ji sinciya jina Kurd e.

Eger mirov rewşa jina Kurd di vê şoreşê de baş bişopîne, dê binase ku wê bandora xwe ya erênî li hemî aliyên civakê kiriye, ji ber ku ew ji erkên xwe yên civakî, aborî, perwerde, çandî û siyasî li paş nemaye. Di wan waran de, jina Kurd sazî û komele ava kirine, û li rex wê, her û her hewil dide, ku zarokên xwe ji windakirinê biparêze.

Belê; di eniyên şer de jî, jina Kurd bi rola xwe ya welatparêzî û netwî radibe, ew jî, ligel mêr rûpelên dîrokî ji berevanî, lehengî û pêdariyê dinivisîne, û ew li seranserî cîhanê wek nimûneyeke dîrokî ji hemû jinên cîhanê re tê binavkirin.

Ma gelo destan û lehengiya pakrewna azadiyê Arîn Mîrkan ya ku li Kobaniya berxwedanê hate nûsandin tê ji bîrkirin? Birastî; kar û xebata ku îro jina Kurd dike, ew tê wateya têgihîştin û asta bilind ji welatparêzî û netewperwriyê.

Rast û durust e; ji berê de bav û kalên me gotine: (**Şêr şêr e, çi jin çi mêr e!!**).

**Rizgarkirina Kobaniyê ….** Dûmahîk

rehakirin(rizgarkirin), pişt re bi dehan gund ji tunrewan hatin pakirin, û dê şahiya me bi serî bibe, gava hemî gundên navça Kobanê rizgar bibin.

Roja îro, hemî hêzên aştîxwaz û mirovperwer, kar dikin ku ev girûpên têror bişkên û ji kiryarên wan reha bibin. Ne veşartî ye ku van hêzên reş çi aniye serê gelên herêmê û hîn jî kiryarên wan li Sûriyê, Îraqê û Libnanê berdewam in… Ev hêzên têror bûne wek malka pilindir li piraniya cîhanê belav dibin. Loma jî, şikandina wan, şikandina ling û sertîrên dijminên gelê Kurd û hemî mirovatiyê ye.

Ji ber vê yekê ve û ji bo vê armancê, hevkariya cîhanî peyda bûye, û Kurd jî ketine nava ew hevkariya navdewletî. Lê belê ta ku em baş ciyê xwe tê de bigirin, merca yekîtî û lihevkirinê bi lez bi me gerek e.

Weke hate dîtin, serketin ji encama yekîtiyê Kurdan bû. Lewre, divê bizava kurdî li Rojava welêt bi lez peymana Dihokê cîbcî bike, û wek hêzek serkirde û berpirsiyar dilsoziya xwe nîşan bide. Ev kiryarên ku li paş morkirina peymana Dihokê bûne, û bêparhîştina du herêman ji Kurdistana Rojava (Efrîn û Kobaniyê) û di paş re jî, bi behaneya (hice) vala ku sê partiyan di hilbijartinê de dengên xwe dane partîne din, û ew biryara bi lez û bê pîvan ku pê ji nava ENKSê hatin derxistin, ev kar û biryar hîç nakevin berjewendiya yekîtiya hêzên Kurdî.

Roja îro ji hemî hêz, sazî û dezgehên kurdistanê tê xwastin, ku gotara Kurdî ya rêzanî li hember dost û dijminan bibe yek, kurdan bi hev bidin hezkirin û bi hev ve werin girêdin, taku gelê me bi hêvî û daxwazên xwe gihîne.

Serketina Kobaniyê destkewtineke pir mezin e, ew serketina hemî hêz, partî û kesan e, biserketina yekîtiya kurdan û kurdayetiyê ye. Giring e ev ji me re bibe hîmê bingehîn ku yekîtiya xwe li ser ava bikin, û ji şahî û serketina mezin û gewre re bixebitin.

**Komara Mihabadê .**Dûmahîk

**berjewendiyên hêzên cîhanî yên mezin wek Sofyetistana berê, Înkiltera û hin dewletên din bi şêweya xwe ya dawî nehatibû zelalkirin, ne jî piştgiriyeke rast û xort ji aliyê tu hêzên cîhanî yên wê demê ji Kurdan re hebû. Belkî ji hin aliyan ve hebû, lê ew ne piştgiriyeke stratîjî bû. Di wê demê de Kurd jî ne xwedî hêzeke leşgerî ya rêxistinkirî bûn. Ji ber wê jî, ew derfeta zêrîn ya nîvê sedsala bîstan ji destê Kurdan hate berdan, lê ew nebû bend, ku gelê Kurd ji xebata xwe ya rewa paşde bimîne, û ta roja îroyîn jî, şoreşên Kurdan ranewestîne.**

**Eger em rewş û qonaxa ku têde Komara Mihabadê hatibû ragihandin, û ya dema niha bidin ber hev, bêguman ne tenê rewşa Kurdan, lêbelê ya cîhanê jî, ji bo doza kurdî, ji ya wê demê baştir e, û rêjeya ku Kurd bibin xwedî Kurdistanek azad û serbixwe jî derfeteke zêrîn heye. Çimkî hemî cîhanê û nemaze dewletên Ewrupî û Emerîka bi erênî, çi di warê siyasî û çi jî, di yê leşgerî de piştgiriya Kurdan dikin.**

**Bêguman piştgiriya ku ji Kurdan re tê kirin, ew ne ji valahiyê hatiye, û ne jî, ji bo reşbelekiya çavên Kurdan e, lêbelê pir sedemên girîng jê re hene û hin ji wan sedeman ev in:**

**1- Piraniya dewletên cîhanî yên ku berjewendiyên xwe yên stratîjî li Rojhilata Navîn hene, û di pêşî de Emerîka, Înkiltera, Firena û ta Rûsiya jî, têdigihên eger doza kurdî netê çareserkirin, tucarî hêminî û aramî di vê herêm de çênabe, û ew bandoreke neyînî li wan berjewendiyan dike.**

**2- Piştî hilweşandina rêjîma Îraqê ya xwînrêj û avakirina Sistemeke fedral li Îraqê, ji hemû milet û hêz û deweletên cîhanê re hate diyarkirin, ku Kurd dikarin bixwe xwe rêve bibin û bi şêwakî demoqrat, nimûne jî Başûrê Kurdistanê ye. Ne tenê wisa; ji gelên cîhanê re hate diyarkirin, ku Kurd miletekî aştîxwe, mirovhez û ne dijber e. Ew ne miletekî şûfen û nijadperest e. Ew rêza hemû ol, bawerî û netewan jî digire.**

**3- Di van çend salên dawî de, û nemaze piştî şoreşên gelên Ereb û rûxandina hin rêjîman û hin jî li ber rûxandinê ne, bermayên wan rêjîman û yên ku hîn li ser destlatiyê ne hîştin ku zêdetir rêxistinên terorîst û tundrew di herêmê de gol vedan, û derfeta ku kiryarên wan yên hovane derbasî dewletên Ewropî û Emerîka bibin zêdetir bûn. Hate diyarkirin, ku yên birastî û bi şêwakî piratîkî şerê van çete û rêxistinên terorîst û tundrew dikin, pirtir Kurd in. Ji ber wê jî piştgiriyeke piratîkî ji Kurdan re tê kirin, û wek nimûne li Şengal û Kobanê.**

**4- Di dema niha de Kurd xwedî hêz in, û ew hêzine rêxistinkirî û xwedî taqe (tecrobe) ne, ango dema çek û alavên şer li ber destên wan hebin, ewê bikaribin di kurtirîn dem de wan tundrew û terorîstan dorpêc bikin û wan tune jî bikin. Û baştir e ku îro hêzên kurdî Pêşmerge, YPG û YPJ digel hev li hember terorîst û tundrewan şer dikin, û biser dikevin. Bêguman, ev cihê balkêşî û razîbûna hemû milet, dewlet û hêzên cîhanî yên mirovperwer in.**

**Ev tê wê wateyê ku qonaxa ku îro Kurd têde dijîn, ji ya dema ragihandina Komara Mihabadê baştir û pêştir e.**

**Lê pend û şîreta Kurdî dibêje: Malbata ku her yek bi serê xwe be, kesek guh nade wan. Ji bo ku derfeta sedsala bîst û yekê jî, ji destê me neçe, û nifşên siberojê sipasiya me bikin, divê Tevgera Siyasî ya Kurdî û Kurdistanî nakokiyên navxweyî bidin aliyekî û di hemû waran de hêza xwe bikin yek, û xwe bikin xwedî yekbiryara siyasî. Di di vî warî de lidarxistina Kongira Netewî ya Kurdistanî ew rastirîn navnîşana yekrêzî û yekbiryara siyasî ya kurdî ye.**



# Wezîrê Eşo Bextê Xwe kir

Zîna Îbo- Parîs



Wezîrê Eşo neviyê Hûtî Begê wezîrê padşatiya Êzdîxanê ye, di jiyana 81 saliyê de bextê xwe kir.

Wezîrê Eşo ji Kurdên Êzdiyên Ermenistanê ye, li gundê Pampê (Sîpan) li sala 1934an çavê xwe dinya ronik dît. Malbata Apê Wezîr jî, mîna Êzdiyên mayîn ji ber şerê dîndariyê, ji Bakurê Kurdistanê direve aliyê Ermeniyan û li ba wan rûdinin.

Wezîr li sala 1958an, beşê ``dîroknasînê`` li zanîngeha Yêrîvanê tewaw kiriye. Û di navbera salên 1961ê- 1964an de bû pisporê Kurdnasiyê di zankoya Rojhilatzanînê de li bajarê Lênîngiradê.

Neviyê Hûtî Begê wezîrtiya paşatiya Kurdî ya Êzdîxanê dike, ew radihêje şûrê divîtane, û pirsa Kurd û Kurdistanê di hemû waran de û heya nefesa dawî ji jiyana xwe bi ser de mijûl dibe, wê nasnamê dikole, dide ronîkirin; ji wê pirsê re li bersiveke durust û watedar digere. Û herwiha, ew pirs hemû dibine gotar, kurteçîrok, roman, pirtûk.. û têne belav kirin. Di wan deman de, bi dehan pirtûk, çêrok, roman, gotar û nivîsarên wî di gelek waran de hatine çapkirin û belavkirin, û hinek li benda çapê ne. Û li demeke dirêj di rojnamgeriya Ermenistanê de dixebitî û divîsand û jê re dibû rêdektor jî.

Piştî şikestina Yekîtiya Sovêtê li dawiya salên 90î, Wezîrê Eşo berê xwe dide Ewrupa Rojava, li Belcîka, li Paytextê wê li Biroksêlê bi cî dibe. Li wir, êdî li Bîroya Kurdî berebere dihêwire.

Çend sal wergî derin, Wezîrê Eşo bi awakî rojane li Bîroya Kurdî di gel Perwîn Cemîl dimîne. Bîro jê re dibe derfeteke nirxdar, û ji nû de, Apê Wezîr bi jiyana pîrî divîta şûrbir dide xebatê, dinivîsîne û sêmînaran lê amede dike, ew ji rojhilatê de heya ber devê hêvarê li Bîroyê dihewe.

Wezîrê Eşo di xebata Kurd û Kurdistanê de naweste, berdewam xwe didayê, lê pîrî êdî wî diwestîne û çend caran dikeve xestexanan. Cara dawî li 9-ê Meha Rêbendanê, zora wî diçe û li 23ê mehê diçe ser Heqiya xwe ya Kurd û Kurdistanê. Miletê Kurd bi zadekî(law) wiha şanaz û bextewar e.

Malabata Apê Wezîr, dost û heval û hogirên wan, çi Kurd, çi ne kurd, û partiyên Kurd, tê de jî partiya Yekîtî(PYDKS), hemû bi hev re Neviyê Hûtî Beg, li 29 mehê, dispêrine Goristana Fillan a Bruxeles: KERKLAAN 164, 1731 ZELLİK.

Êdî li gizîrên Wezîrê Kurd dimîne, ku xebat û berhemên wî yên ku mane li 'erdê nehêlin, tope hev bikin, û dam û dezgehên Kurd û Kurdistanê jê behredar bikin.

## Nameyeke Sersaxiyê

*** Wezîrê Eşo jî ji nav me barkir ***

Wezîrê Eşo, apê Wezîr, dilhezê gelê xwe û mirovahiyê, cefakêşê di ber min û te de, xwediyê gelek berheman, rewşenbîrê gewre û mezin, li welatê xerîbiyê, dil rawestî, çav damrandin, ji vê dunyalika şêrîn û tevlihev barkir, û em li şûna xwe hêştin.

Wezîrê Eşo , bû mêvanê heval û dostên xwe yên hêja, mîna Mûsa enter, Cegerxwîn, Qanatê Kurdo, Casimê Celîl, Mihoyê Îboyan, Dr. Qasimlo, Esmet Şerîf, Dr. Nûrî dêrsimî, Osman Sebrî, Samî Rehman û Lazirêf.... Diponijim û dibêjim, ku ew tev dê ji ber rabin, kumên xwe jê re deynin, wî hemêz bikin û herin dev û rûyê wî .

Apê Wezîr heyranê miletê xwe bû, kul û derdê wî zanyarî û hişyarkirina kurdan bû, hesreta dilê wî Kurd û Kurdistan bû û ne tenê ji xwe re bû .

-Bila serê we hemiyan sax be .

-Bila dost û merivên Apê Wezîr, zaro, êl û malbata wî sax bin. Bila gelê Kurd xweş be.

-Wezîrê Eşo ji bîr nabe.

Efrîn – Kurdax
29.01.2015

***Hûn bimînin di xweşiyê de... Û spas***

*Sekretêrê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Birayê we ...
**Mihyedîn Şêx Allî**